# Peykerên bajêrî

## Hemkê tuvî

**berhevkirin u foto: Bilind Mihemed**



Zarokên xweştivî.... Hemkê tuvî stiranbêj bû, li vêre hewe zanî ka ew çî ye. Erê didemên berê da ne weku nihu bû ku me hemîyan têlevzîwn û radîdu û vîdîw û hêla entirinêtê heye û bivan hemî rêka em dişên guhdarîya stiranan bikin. Belê li demên burî, mirovên mezin weku mîru seruk eşîre û bega, stiranbêjên xwe yên taybet hebûn û li kuçik û dîwanên wan stiran digotin.

Li mîrgeha amêdyê jî û li ser demê mîr qubad beg mîrê amêdyê, berî (300) salan hemkê tuvî stiranbêjê mîr qubad begê bû. Li kuçik û dîwanên wî stiran digotin.